

Kiriyariya Roja Nû: ji bona erdên Sûriye û Libnanê, 35 Hreyên Sûrî; ji bona welatên din 4 Hreyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê; 25 Qemerf.

# ROJA NÛ

Dîwan û gerfendekariya Rojname: Bêrût-Birc: Weqîf Tabet, Telefona Dîwana: 74 04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-KAN

## NASKIRINA KURDISTANÊ

Naskirina Kurdistanê karekî zehf dijwar e; ji ber ko civateke zanistiyê nikare tê de bi serbestî bigere û bixebite. Emê ceħda xwe bikin û eşîrên Kurdistanê jî xwendevanên xwe re, li gora taqetê bidin nas kirin. Bê şik tiştê ko emê bikin ne tewaw e, û ne jî yekcar rast e; lê her hal jî tunebûnê çêtir e. Heke xwendevanên me; di vê babetê de arikariya me kirin; em rojekê wê bikarin, xebateke hêj kûrtir, çêtir û dorgirtirî pêk binin, û baxin pêş çawan. Eşîrên Kurdistanê Iraqê ev in.

Erdê Zaxo: *Heccan, Gewdan, Mamaxuran, Semirigan, Kullîyan, Şîfermenîyan.* Ev eşîr koçer in, 33.000 nefs in. Axayên van Hacı Axayê Mihemed Axayê û Teyyar Axayê Xidir e; ev axa di gundên germawa û Avtehlê de rûdinin. Serekê Şîfermenîya Hacı Bedir Axayê ye, li Spîndarokê rûdine. Sermîyanê Sermîriyan li Tilzêdî rûniştiye.

Eşîrê erdê Zaxoyê ên din ev in: *Sîfêvana, serek Hazim Beg, li Zaxoyê rûdine; 10.000 nifûs. Sundiyo, axayên di wê Ebdîl û Cemil Axayê, li Marsê rûniştî ne, 7.000 nifûs. Guliyê, serek, Hacı Sadiq Axayê Bîro, li Behnûna rûdine, nifûs, 5000. Benestaniya, serek Huseyin Axayê Xazî, li Berzûrê rûniştiye, nifûs, 4.000. Lêfîkiya, serek, Yûsîf Ismil, li Ermiştê rûniştî ye, nifûs 3.000.*

Erdê Dixûkê: *Dostikiya, serek, Seid Axayê Small; li germawa rûdine, nifûs, 10.000. Hinbiyan, serek Şefîq Axayê Small, li Zêwa rûdine, nifûs, 2.000. Mizûriya, serek, Şêx Nûrî Brîfkanî, li Brîfkan rûdine; nifûs, 15.000. Çelê, begê wê, Ewliya Beg, li Çelê rûniştiye.*

«Xwendevanên me ba' a xwe dauc ko em berî navê eşîr, bi dî wî ve, navê serek, di pişt re navê gundê ko serek tede rûniştî ye û dawî nifûsê eşîrê dinivîsin; êdî em bawer dikin ko ne hewce ye, navê serek, û gund û nifûs, her û her du car bikin.»

Erdê Imadiyê: *Berwarî jorî, Berwarî jêrî; Tewfîq Beg Hacı Reşîd Beg, Derşîsê, 50.000. Oramariya; Sedîq Beg kurê Sîto axa; Nêrwa; 6.000. Bamîrî; Şêx Behaeddîn Neqîşbandî; Bamîrî; gund 50. Zêbarî; Mehmûd Axayê; Zêba; 7000 mal in.*

Erdê Barzanê axa bile; *Rêkanîya, Kelxo Axayê, 8000. Mizûrî jorî, Mizûrî jêrî, Kurşîd Axayê, 15.000. Berojî; Qadir Axayê Osman, Barzan, 18.000. Şêrwanê Mezîn, Mihemed Axayê, Barzan, 22.000. Şerfan; Ebdîlrah Axayê, Barzan, 10.000. Ev her pênc eşîrên jorîn, ev eşîrên dilawer in ko arikariya Mela Mîstefa Paşayê kirine. Yezîdîyan pênc lek in; Şêxan, Denan, Dasikan, Reşikan û Dasiniyan; serekê wan Miawîyan beg kurê Seid beg e, li Beadîrê rûdine, 500 gund in.*

Axa Rewandîzê: *Balek; û Wertî; Şêx Mehmûd Axayê Welas; Mihemed Emin Axayê Nawpîrdanê; Welas; Nawpîrdan; gund, 300; û nahîya balek de rûniştî ne. Bradost; Mehmûd begê Bradost; Sîdekan, gund, 200; di nahîya Bradost de, rûniştî ne. Şîkak, gulizâr Xaniyê û kurê Seyîd Taha Pûşo, li havînê, der jûjêlê û li zivistanê li Rewandîzê rûdinin, gund 10. Sârçîqan, koçer in; Xidir Axayê; li bakurê Rewandîz, nifûs; 10.000. Herkiyan; koçer in; Ebdîlkerîm Fetah Paşayê; nifûs, 15.000. Zengeniyan; Mihemed Axayê; Zengene; nifûs; 5000. Bolekî; navê Axê ne hatiye zanîn; ew li gundê Bolekîya rûdine, 600 mal in. Herûlî; Boşyê; beg; Eshed Axayê; Çînarî; gund 200. Şîwezûrî; Mîstefa Axayê, Gundejûr; gund 70. Dûlemerî; Begust Axayê, badîlyê; gund 20. Serçîyayî; Xidir Axayê; Serçîya, gund 15. Xeylanî; Kerîmîyan; gund 300. Namsal, navê axa û gundê wî ne hatiye seh kirin; 700 mal in. Mentik; Ewîlrah axa, 200 mal in.*

Erdê Şîngalê; *Sincarê; Xatûna 160 gund in. Dasikan, Reşikan, Dasiniyan, Hewerîyan 25.000 kes in; serekê wan; Xwedêda kurê Hemo Şero; û Dawîdê Dê-wadî; ji xatûna pê ve hemî li ser dinê kurdanê e berî ne: eyzedî ne. Qeza Têlaferê; Gergerîyan; Celâd axayê kurê Sadûn axayê; çend kes in, me seh ne kir.*

Erdê Akîre, Eqrê; *Rejûkera; Seid axa, Zînana, nifûs, 3.000. Goranan; Small axa, Berderê; 6.000. Sârçîqan; Şêx Reşîb; Serderîya; 15.000. Zêtkan; Memê axa; Şîkêlîndîya; 4.000. ji wan reşairê sebhe dibêjîn; me nav û nîşanê wan hêj qenc seh ne kir; bitenê em dîzanin ko serekê wan di gundê berde-Reş de rûdine û hemî pev re 200 gund in.*

Erdê Hewlêrê: *Dîzeyî; Dizdeyî, Dizdeyan; Xidir Paşayê; Ezîz axayê; Deştê Qereçoxê, li nahîya Dîbeyayê; 10.000 mal in; li nîroyê Hewlêrê. Gerdî; Cemil û Mecîd axayê gerdî; Kor; 200 mal in; li rohelatê Hewlêrê. Herkî; betah axa; Miraxûr, 2.000 mal in, koçer in, havînê de diçin Kurdistanê Iranê. Şêx biziniyan, Mihemed axayê Huseyin axayê; Deştê Şêxbiziniyan; 6.000 kes in.*

Erdê Koysinceq; *Şedela; şêx Ebdîlkerîm; şedal 30.000 kes in.*  
Erdê Sîleymanî; *Çaf; Dawîd beg, Hemîd beg; Helebçe; 50.000 mal in. Pişder; Babekîr Axayê, Ebas Axayê; Q elhet Dîze, Mamet, gund 500. Hemawend; kurekanê Kerîm beg; Çemçemal; gund 700. Simayêl Üzerî; simayêl axa; silêmanî; gund 50. Hewreman; kurekanê Cafer siltan; Temêle; gund 400. Merîwan; Mehmûd Xan; kanî sanan; 420 mal in; koçer in.*

Erdê Kerkûkê: *Kakeyî; Fetah Xelîl Axayê; Heftexar; 500 mal in. Talebanî; Şêx Hebbêb; Kerkûk; 2000 mal in. Zengene, Mihemed Kerîm axayê seymensûr; 150 mal in. Dawîde; Dara beg; Tawox; 3000 mal in, Berzince; seyîd Ehmed Xaneqayê; Kerkûk; 7000 mal in. Cebârî; Cebâr seyîd Mihemed; Cebârî; 7000 mal in. Şîwan, navê serek ne hatiye zanîn, 7000 mal in. Zend; Koxa Xenî, Kîfrî; 200 mal in. salihî, navê serek ne hatiye seh kirin; 400 mal in.*

Nahîye Şeqlawe; *Koxnaw; sedîq beg; Şeqlawe; gund 300 Qeza Mexmûrî. Dizeyî; Xidir Paşayê; Kerdînanaw; gund 400.*

Nahîye Helebçe û Pêncwîn; *Mukriyan; Şêx mehmûd, Çîyayê sîrdaşî. Rayet; Eb as axa; Rayet; 2000 mal in.*

Qeza Raniyê; *Bilbas; Xebûr axa; sengesor; gund 300. bûrî; mihemed axa; gund 100.*

Erdê Diyale; *Şerfbeyanî; Osman beg; Tahir beg; Horên û Şexan; 800 mal in. bacelan û bavkê wê Cimûr; Ewîlrah axayê; Mecîdîyan salar, mecîd Qadir axa; Cihanhexîş; Xaneqîn nahîye Qoretû; 1500 mal in, Talebanî; şêx Wehab (naib e) û şêx mihemed şêx seîd; Qoretû; 500 mal in. Kakeyî; Şêx Hemûd; Ebas Üzeyir axayê; Xaneqîn; 20 mal in, Delo; 1000 mal in. Delo li Kîfrê jî hene.*

Erkewazî; *Elîxan; Xaneqîn; 800 mal in. Zergoş; muhsin Ezîz, Qizlerbat; 500 mal in. Qere-ulus; navê serek ne hatiye zanîn; ew li dora mendelî rûdine; 1000 mal in. sûremêrî; Koxa mîbarek, mihemed Ezîz; li dora Xaniqînê rûdinin. 500*

### Çirok

## Sînema bi ser dûman

Zemaneke zilamek hebû, kurekî wî û keçîka xwe hebû û diya wan tine bû; navê keçîkê Sînema bi ser dûman bû. Zilam û kurê xwe va çûn hecê, û keçîka xwe li mal hiştin, nan û av dînan cem, û jê ra got: derî ji kes ra pemeke heyant em ên, û bi mileyê gund ra got: her rojekê ti kê herê ber deriyê mala me û li hale Sînemê dipirse; û çûn hecê. Rojekê dilê mile pis dibe û bi sînemê ra dibêje derî veke, min ji te ra henarek. Sînemê jê ra got: ez derî ji kes ra venakim. Mile got: destê xwe dirêj ke ez bi te dim. Sînemê destê xwe dirêj kir. Mela mekîn bi destê tsînemê girt û jê ra got: derî veke, ya ezê destê te qitî kim. Sînemê derî veke. Mela jê ra got: bi mi ra bi yek be, ya ezê te bikîjim. Sînemê lê vegerand hana nabe, emê serêbîşan û paşê emê kêfa xwe bikin. Mile got: baş e. Sînemê av jê ra keland û got de were, mile hat û xwe tazî kir, sînemê awa kell li serê mile kir; û mile bê aqil ket. Sînemê bi desta girt û dîna dera.

Paşî, bi çend seatan aqil hat serê mile û çû mala xwe. Mela çû cem pîrek cazû û jê ra got: sînemê ji min ra hûnî hamamê; ezê deh zêra bi te dime.

Pîr çû deriyê mala sînemê; û jê ra got: derî veke ez xatîlka te me; paşê sînemê jê ra derî vekir. Rojekê pîrê bi sînemê ra got: rabe em herin ser tîrba diya te sînem qail bû û wê ra çû. Sînemê didê gertî û pîr xeyza xwe te çavê dihêlê, paşê hatina mal. Rojekê pîrê jê ra got rabe em herin hemamê. Sînem qail bû, xwe ra bir; û Mile jî li hemamê bû. Mile bi destê sînemê girt û jê ra got: ti bê bi mi ra bi yek be. Sînemê jê ra got: baş e; em hana nabe; lê araqî wê hânê; emê ewxistin û paşê emê kêfa xwe bikin. Mile araqî hantî û rabûn wezardîne; sînem bi dîzi dirîjî-ne û mile jî vedixe. Mile seroş bû û ket erdê. Sînem rabû û çû mal.

Dema mile bîstî; bavê sînemê jî hecê lê; mile çû cem û got: her rojekê sed xorî derin mala te, cem keçîka te. Hecê got: bi lawê deh zêra ra: here wê orispê bikuje û çavê wêna bine ji mi ra. Kur çû ber derî û ban sînemê kir got: derî veke; ez birayê te me; sînemê got ez derî venakim ti birayê minse gîstlîka xwe pêşe mi ke.

Brêk gîstlîk pêşî kir. Sînemê derî vekir û gelek dilxêz bû. Brêk jê ra got: çavê xwe girde û li paş min siwar be; sînemê li paş siwar bû û di zew va çû. Brayê sînemê, sînem bir berda çiyakî asê û hat mal. Paşê sînem bi xwe hesta û seh kir kesik lineye. Rojekê, kurê paşakî hat nêçîrê; navî o çiyayî. Carekê, seh kirin ko kûçêk xwe çû û rewî tiştekî; ber o tiştî çûn, nêrin ko keçîk bandike: me tén ez tazî me; kurê paşê got: be ou; cilê min ji ramilla li xwe ke û were: zilamê kurê paşê çûn û hanin kurê paşê bi xwe ra bir hemamê û ser berber û cilênê pak û rind lê kirin. Kurê paşayî ti kêçka na ecbineye; dema sînem dî; dilê xwe ketê û bir.

Paşî saleke kurekê xwe bû; dema kurê paşê seh kir sînemê bîra bav û Brayê xwe kirî. Bi mileyê gund ra û bi du erebana şande mal. Mile bi sînemê ra got: were em nanin xwe bixîz. Sînem hat rûniştî. Mile bi sînemê ra got: ti kê bi mi ra; bi yek be, ya jî ezê kurê te serjêkim; sînemê got: serjêke; mile kurê sînemê dikuje û ban sînemê dîke. Tîkê bi mi ra bi yek be; ya ezê te jî bikîjim; sînemê got: bisebire; ez du rîkêlî timê bikim paşê min bikije; sînem rabû û çû timê bîko û ban Xwedê kir û bi emrî Xwedê bû marekî û ket nav keoran. Paşê mile çû cem kurê paşê û got ew şîlî hewqanek te biribû; ha îşle bi çolê de revî û çû.

Paşê; sînemê ban xwedê kir û emrê xwedê bû; keçîk û hat pariyê kurê xwe da berhevo û ban xwedê kir, bi emrê xwedê can pê hat û kîncîn pis lê kirin û çû cem şivanekî got: ti va berzî nafrosê; got: ez bi pera nafrosî yekî çû cem yekî dîn; paşê çû cem yekî dîn got belê ezê bifroşim; bi du zêrn. Sînemê kirî û postê wî çêkir û girle xwe û çû cem mîla bayê xwe û ji wan ra got: ez kê li cem we bi xadim bime; gotin baş e. Rojekê kurê paşê û mile û mileyê dîn va hatin mala hecî; paşê ban xadimê kirin û jê ra gotin: ji me ra bi kilama dî. xadim got: hemo derî bigirin in kilîl bi des mi dîn ezê ji we re ketam dim. Kilîl bir û satra: li ser xwe; paşê çû cem bavê xwe û jê ra got û postê xw dîna ber: ez keçîka te me û ev jî mîrê min e û ev herda mile, ez hona hona kirin, rabûn serê her du mileya jêkirin û sînem jî da kurê paşê. Mirazê sînemê bû û mirazê we jî bibe.

Mihemed Cafer şêx Ismail Zade

## Rojnameyên Cihanê

### û Pîrs û doz û dehwa Kurdistanê

Ev çend meh in rojnameyên cihanê bi pîrs û doz û dehwa Kurdistanê mijûl in; ne maza rojnameyên bêrûtê gên bi zîmanê erebî û frensîzî; û gên Parisê mîna «Le Monde», «France Soir», «Combat», «Renaissance» û hin rojnameyên amerîkanî û rojnameya inglîzî «News of the World»; rojnameyên Felestinê mîna «Palestine Post» zehf rojnameyên ko bi zîmanê îbranî derdikevin; rojnameyên Misrê gên frensîzî û erebî; û rojnameyên Yewnanî; di heqê Kurdistanê de û li ser dawazêzê neh milyon kurdên ko xwedî erdektê mezin in -pênc sed hezar kilometrî çargûşebendine hêja; nivîsarinê dîr û dirêj belav dikin û dibêjin ko miletê Kurd ji bona îstîqalata xwe, ji bona azahî û serbestiya xwe xwîna xwe rîjandiye û tro jî derfîne û niho Kurdistanê Tirkiyê. Iran û Iraqê bi destê Cîvatinê baş saz û terîtkirî tîne gerandin û îcar xebata dehwa Kurdistanê jî her wezîl bêtir û çêtir xurt e; û di vê demê de jî bona miletêkî mezin, ji neh milyon peyan bihevketî, hêstîrî çêna-be û rahetiya dînyayê û nemaze silametiya welatên Rohelatê Nîzing û navîn, bê saftîkirina pîrsa Kurdistanê pêk naye.

### Di Cîvana Londrê de

Li gora telegrafta ko nûçegihayê ejansa frensîzî A.F.P. ji Enqerê belav dîke; tede tu şik nîne ko pîrsa Kurdistanê di cîvana Londrê de, ya miletên yekbûyî wê bikeve axaftîne.

mai in. Ev çar eşîrên jorîn, berî bi 200-300 salan ji Lovîstanê hatine, lor û şî-ne û xwerû kurd in.

Di Kurdistanê Iraqê de, hin eşîrên din û di nav wan de, eşîrên mezîni mîna Piştîkûh û goran jî hene ko me hêj xweş seh ne kirîye. Piştîkûh 40.000 mal in. goran xwedî heft lek in; û serekê her lekî re siltan tete gotin; haft siltanên goran hene. Herwekî xwendevanên me dibînin, rûniştîyanên bajar û şarîstana Kurdistanê Iraqê, ne hatine di nav hejmartiyarên goran. Hejmarê ko bê emê bi eşîrên Kurdistanê Iranê mijûl bibin.

# Tefsîra Quranê

73 - Lawên Israîl ji me re sund xwarî bûn û me ji wan re pêxember çandin, lê her cara ko ji wan re pêxemberek dihat û emrên wî ne li gora dilxwaza wan dibû, wan ew dikuştin, an gotina wî pûç û pêxemberîtiya wî inkar dikirin û digotin, ew derewan dike.

74 - Ew ji xwe re hisab dikirin ko wî emelê wan bê ceza wê bimîne ji ber vê yekê dilê wan hişk bû, wan rastiye ne didtin û ne jî dibihîstin, piştî tobedar bûn û Xuda toba wan qebûl kir, paqî ji nû ve piraniya wan asê bûn û fîsa rastiye ne dibihîstin û ne didtin; Xuda emelê wan dibîne.

75 - Ji Filan, yên kogot: Xuda, Mesîh kurê Meryemê ye; ew kafir bûne. Mesîh ji wan re got: Gelf lawên Israîl, ji Xudayê xwe re perestîgê bikin; ji ber ko ew Xudayê min û we ye; yên ko tişteki dikin hevber û hempaye Xwedê; ji wan re bihuşt heram dibe, qereregehê wan dojehe û kes ni kare arîkarê wan bibe û wan jê derîne.

76 - Ji Filan yên ko got, çyêki ji sê Xudan Xuda yex kafir bûne, ji Xuda pê ve tu Xuda nîne û xuda yek e; heke ew dev ji wê gotinê bernadin kafir dibin; û kafirên di wan bi ezabekî giran wê bêne şandin.

77 - Ma ew na xwazin dest ji wê gotinê bikişînin, vegerin rîya Xudayê xwe, tobedar bibin û efiwa Xuda bixwazin! Xuda ji tobedaran re tobe dide, di gunehên wan dibore, Xuda delal, piyar û dilovan e.

78 - Mesîh kurê Meryemê, mîna pêxemberên ko heriya wî hatine pêxemberek e, diya wî Meryem, bi her hewayî jîni keke pak û dilrast bû û her du jî, weke mirovên din dixwar û vedixwarin, insan bûn; binêre em çawan ayetên xwe şanî wan didin û ew çawan mirûçê xwe jê dizivirînin û pê zendemayî dimînin.

79 - Ma hon dixwazin, ji Xuda pê ve, ji tişteki din re jî; ibadete bikin, tişteki welê ko ne qenc û ne jî xirabiya wî dikare bigehe we, yê bihistiyar û zana Xuda ye, ew emelên we dibîne û gotina we dibihîse.

80 - Gelf xudankitêbino... neheqiyê me kin, dev ji rastiye bermedin û derbazî şnorên dîne xwe me bin û me kevin pey mezînen xwe yên ko beriya hatina Bezma Muhemed rîya xwe şağ kiri bûn û xelkê xapandin û ji rîya rastiye derketin.

81 - Heçî ji lawên Israîl kafir bûne, Xuda li wan bi zîmanê Dawûd û Îsa kurê Meryemê lanet kiriye; ji ber ko ew asê bûne û tada li emrên Xwedê kirine.

82 - Wan destên hev û du ji kirîna xirabî û jî bêdîniyê gunda venedigerandin, emelê wan çiqas kirî û bêkêr bû.

83 - Tu dibînî ko piraniya wan hevaltiya dîn-nezanan dikin. Ew ji bo dawîya nefsa xwe û ji bo roja piştawiyê çî tiştên kirêt û bê xeyr li hev tînin; Xuda ji wan dienite û ewê bikevin ezabî û tê de her bîmînin, jê derketina wan nîne.

84 - Heke wan xudankitêban, baweriya xwe bi Xuda û pêxemberê di wî û bi kitêba ko jê re hate dahatin bianiyana edî wan dîn-nezana ji xwe re ne dikirin heval, lê çî feyde piraniya wan fasiq in.

85 - Lê tu bibînî ko di nav mirovan de cuhî û dîn-nezan ji her kesî bêtir dijminê bawermendan in; û yên ko baweriya xwe anîne û dibêjin «em file ne», ew ji her kesî zêdetir nîzîkî misilmana ne, ji ber ko di nav wan' de keşe û mitranên hene û ewê ha ne nefsmezin in.

86 - Her wekî ew dizanin ko Quran ji pêxemberê Xuda re da dahatin, kitêba Xwedê ye, gava Quran tê xwendin ew bi têsra rastiya hikmên Xwedê dest bi girîne dikin û dibêjin: «Xudayê me, me baweriya xwe aniye, em pê qehditiyê didin, navê me jî weke şahidekî binivîse cem xwe.

87 - Ma çima em baweriya xwe bi Quran û pêxember ne yînin? Em lavekarê kerema Xudayê xwe ne, em jî dixwazin ko Xuda me bigihîne peyayên xwe ên bağ.

88 - Xuda ew gihandin sebaba xwe, ewê bikevin buhuştên tîr av û kanî û tê de her bîmînin, ev şağaqê qencîkera ne.

89 - Yên ko kafir bûne û ayetên me inkar kirine û derew bi alf ayetên me ve dane, ew ehle dojehe ne û tê de her dimînin.

90 - Tiştên rind û xweş ko Xwedê ji we re helal kiriye, ji xwe re me kin heram û tada li emrên Xuda me kin, Xuda ji tadakeran hez na ke.

91 - Ji tiştên çak û bağ ko Xwedê ji we re helal kiriye bixwin û vexwin û li gora emrê Xudayê ko me pê baweriya xwe aniye bimeşin.

92 - Seba sundên we ên bê hemd Xuda we berrisîyar na ke; lê heke we qesdanê sund xwar, ji we re kefarete divêtin, kefareta wê ev e: divêtin deh belengazan bi xwarîna heja ko hon ji mirovên di xwe re didin; tîr bikin; an deh belengazan bibijêrin û her yekî ji wan re destek cil bidin, heke hon ni karin wan tiştan pêk bînin; divê hon sî roj rojiyê bigirin; ew kefaretên baweriya we ne, baweriya xwe biparêzin, Xwedê hikm û ayetên xwe pêg we dike ta ko hon qikirdar bibin.

93 - Gelf bawermendino... vewxwarîna şerabê, leyistîna qumare, ibadeta pût û sûretan û vekirîna falê tiştên bêkêr û şuxlên şeytên

in, destên xwe ji wan tiştan bikişînin ta ko hon bigehin qenciya Xwedê û ji ezabê xelas bibin.

94 - Şeytan dixwaze ko hon şerabê vexwin û ibadeta pût û sûretan bikin û qumare bileyîzin ta ko hon dijminê hev û du bibin û li hev bikevin û Xuda me yînin bîra xwe û nîmêja xwe me kin û ji rîya Xuda derkevin. Hon dibînin ji we re kirîna wan tiştan çiqas xirab in.

95 - Bîndestiya emrê Xuda û pêxember bikin, bê emriya wan me kin, hey dîna xwe bidin neyarê xwe Şeytên, çavê xwe vekin û bizanin ko heke we dest ji pêxember berda, hon rîya xwe şağ dikin, ji ber ko wezîfa pêxember şîret û pêşîrîna rîya rastiye ye, heke hon dest ji pêxemberê xwe berdidin divê edî hisabê dawîya xwe bikin.

96 - Yên ko baweriya xwe anîne û qencî kirine; heke ji tiştên ko hatine heram kirin; berî heram bûne wan; xwarîne ji wan re ne tu guneh e, lê divê ew ji Xudayê xwe tirsîyar bibin û qenciye pêk bînin û dev ji tiştên heram berdin û baweriya xwe bi heram bûna tiştên ko Quranê de hatine gotin û hejmartin bînin, û hey ji Xuda bitirsin û qenciye pêk bînin, Xuda hejî qencîkera dike.

97 - Xuda, bi wextê Hecê û bi neçîra destan û bi tîr û kevane hon cerihandin û Xwedê dixwest pê, yên ko baweriya xwe bi tiştên xeybê mîna wehî û roja piştawiyê tînin û yên ko baweriya xwe pê, na yênin ji hev veqetîne û wan nas bike, paş ve ceribandîne ji vîrê ve da; yê ko di bizane Hecê de neçîrê dike, divê dîna Hecê de neçîrê kiran heye.

98 - Gelf bawermendino... di Hecê û Emrê de neçîrê me kin, yê ko di, wê demê de bi hemd ji heywanên neçîrê heywanekî dikeje cezayê wî di Kabê de şerjêkirina qurbanekê ye, divê bihayê qurbanê bi qasî bihayê heywanê neçîrê ê kuştî be; û divê du pispor li ser bihayê qurbanê hikmê xwe bidin, heke qurbanek bi dest ne ket; divê li gora bihayê qurbanê zad bikire û ji belengazan re belav bike, her belengazekî re midek; an ji bona her midekî rojekê rojiyê bigire, ta ko giraniya emelê xwe tam bike, û edî dest jê bikişîne, Xwedê di gunehên mirovên ko beriya vî emrê Xuda di dema Hecê û Emrê de neçîrê kirine dibore, lê Xwedê ji yên ko piştî emrê Xuda neçîrê dikin ewda xwe hiltîne, Xwedê xweyî qudret e û tola xwe vedike.

99 - Dema Hecê de, di behrê de masîvanî û xwarîna goştê masîyan ji we re hate helal kirin; ta ko hon li mal û di rê de jê bixwin û idara xwe pê bikin, lê neçîrvanî di dema Hecê de ji we re heram e, ji Xwedê bitirsin û ji bîra me kin ko honê vegerin ba wî.

100 - Xuda navê Kabê Mala Miqedes danî û pê qedrê wê bilind kir û Mala Miqedes kir

ewlegehê xelkê û çend mehên salê jî kir mehên miqedes û demên ewleyiyê ji ber ko di wan mehan de; tu kes; na be ko bê te kuştin û bi emrê şerjêkirina qurbanan û bi destûra xemilan. Dîna wan û emrê belavkirina goştê wan; wî xwarîna xelkê da, ta ko hon bizanin ko Xuda her tiştên erd û ezmanan dizane û zanîna Xwedê dora her tiştî digire.

101 - Bizanin ko cezayê Xwedê giran e û Xuda efiw dide, Xuda dilnêrm e.

102 - Wezîfa pêxember pêşvekirîna emrên Xuda ye, tiştên ko hon aşîkare dikin an vedîqerînin Xuda pê dizane.

103 - Çê û neçê ne mîna hev in, qedrê tişteki ne bi piranî lê bi qenciya wî ye, eger jî tu ji piraniyê hez dikî, tişteki kêm û çak ji tişteki pir û xirab çêtir e. Gelf mirovên bijîr... ji Xudayê xwe tirsîyar bibin heta ko hon bigehin rîya rastiye û serfiraz bibin.

104 - Gelf bawermendino... ji pêxemberê xwe tiştên welê me pîrsin ko heke cuhwaba wan bihata dayîn, hon xemgî dibûn, li ser herîştî emrê Xuda di wextê xwe de, di Quranê de wê bê gotin, vê gavê ji pêxemberê xwe bipîrsin, ewê ji we re bide zanin; kirîna wan pîrsan Xwedê efiw dike, Xuda di gunehên xelkê dibore, Xwedê piyar e.

105 - Miletên beriya we jî, ji pêxemberên xwe pîrsên wîlo kirin û gava ji wan re cuhaba wan pîrsan hate dayîn pê kafir bûne.

106 - Xuda di heqê derewan de ko we navê wan Behîre, Saibe, Wesîle û Exame daniye tu tişt ne gotiye, ew jî mîna dewarên din heywan in, lê yên ko kafir bûne ji xwe re derewan dikin û derew bi alf Xuda ve jî di dînan û piraniya wan nezanan in, seh na kin.

107 - Gava ji wan re tete gotin, werin û hiya kitêba ko Xuda da dahatin û pêxemberê di wî bikin, dibêjin dîne bav û kalê me besî me ye; bav û kalê wan nezanan û rîya xwe şağ kiri bûn û ew jî rabûn biya wan kirin, ma ev çawan besî wan dibe? Ma tişteki nerast kengê şayesteyî hejkirîne dibe?

108 - Gelf bawermendino... dîna nefsa xwe ji kafîran biparêzin û li ser rîya rastiye bimeşin, zererê mirovên ko rîya xwe şağ kirine na gîhe we, honê vegerin ba Xwedê û ewê di roja piştawiyê de emelên we ên çak û xirab şanî we bide.

109 - Gelf bawermendino... gava mirin nîzîkî we dibe û hon dixwazin wesiyetekê bikin, ji mirovên di xwe banê du şahîden adil bikin, eger hon rewîngî ne û di welatê xerîbiyê de ne û mirin nîzîkî we dibe û dixwazin wesiyetekê bikin ji mirovên xerîb banî du şahîdan bikin; heke ji dilpakîya şahîden xerîb şik ket dilê we; banê wan bikin, wan bisekinînin cem xwe û piştî ko şahî-

dan nimêja xwe a nfvroyé kir divé ew sund bixwin û bêjin: em şehdetiya xwe seba tu tiştî venagêrin û em ne timakare malê mîrathîştene, em şehdetiya xwe ji bo Xwedê li gora rastiye dîzanin ko bi veqartina qehadetê em gunehkar dibin.

110 - Lê heke bate seh kirin ko qahidên xerîb bêbextî kirine vè gavê ji mirovên mîrathîşte du kes dikevin cihê wan û şehdetiyê didin, her wekî ew mirovên mîrathîşte ne, ji qehdetiyê re ji ên din şayestetir û layiqtir in û ew bi anîna navê Xuda sund dixwin û dibêjin: qehdetiya me di xuyakirina heq de ji yê din rast-tir û paktir e û em derbazî snorên rastiye na bin û em dizanin ko me wisa bikira em ji zaliman dibûn.

111 - Bi vî awayî, ji qahidan re dana qehdetiyê li gora rastiye hêsantî dibê; ji ber ko qahid ji xwe re hisab dikin ko heke wan sundekî derewîn xwar heye ko ew tê seh kirin û ew pê riswa û qermin dibin û bi vè melhezê dest ji sundên derewîn dikişînin û bi dilpakiyê şehdetiyê didin. Ji Xudayê xwe tirsîyar bibin, guhdariya emrên wî bikin û bizanin ko Xuda mirovên neçak na ke riya rastiye.

112 - Rojekê Xuda pêxemberên xwe wê bicivîne û ji wan re dê bêje: «gava we ji xelkê re got, werin li ser riya rastiye, wan çî got»; pêxember bêjin: em tiştekf nizanin, yê ko veqartiyên dizanî tu f.

113 - Wê demê bînin bîra xwe... Xuda got: Îsa kurê Meryemê... nîmet û qenciya ko min da te û diya te bîne bîra xwe, min te bi rûhê-miqedes zexm kir ta ko tu di landikê de û di mezinahiya xwe de ji bi xelkê bipeyivî û şîretan li wan bikî û min tu hînfî kitêb û hikmetê, Tewrat û Inçîllê kir û gava te bi destûra min ji heriyê şîklê teyrekî çêkir û lê pîf kir ew bi îza min teyrek bû û dîsa bi destûra min te çavê koran vekir û wan dît, nesaxiya miskînan sax kir û te mirî vejandin û wan ji gorinê derêxist û gava lawên Îsrail, her çend ji tu ji wan re bi ayet û mucîzan hati bû yî, dirêjî te kirin, min destê wan ji te da kişandin, gava wan ev dîtin, yê ji wan ko kufir dikirin got: ev sihirbazîyeke aqîkare ye.

114 - Dîsa bîne bîra xwe... gava min emrê xwe-ko hewariyan divê baweriya xwe bi min û bi pêxemberê min bînin-xist dilê wan, Hewariyan got: me baweriya xwe anîye, Îsa, tu qahidê me bibe, em misilman in.

115 - Gava Hewariyan ji Îsa re got: Xudayê te dikare ji me re ji ezmên sifrekê bi nan û zad bide dahatin, Îsa got: heke we baweriya xwe anîye, ji Xudayê xwe tirsîyat bibin.

116 - Hewariyan got: em dixwazin ji wê sifrê bixwin û dilê xwe pê qanî bikin û em dil dikin bizanin ko tu bi her hewayî ji me re rastiye dibêjî û tu pêxemberê Xwedê yî û em dixwazin pê

qahidên yekîtiya Xwedê û pêxemberîtiya te bibin.

117 - Îsa kurê Meryemê got: Xuda û xudanê me, ji me re ji ezmên sifrekê bide dahatin, bila roja dahatina wê sifrê; ji me re û ji çêliyên di me re cejnêkê be û dahatina wê sifrê nîşanek ji mezinahiya te û dellêk ji pêxemberîtiya min bibe, Xudayê min, me xweyî bike, nandayê mezintir tu f...

118 - Xuda got: ezê ji we re wê sifrê bidim dahatin, lê ji wî paşt yê ko ji we kafir dibin, ezê wan bi ezabekî welê biêşînim ko min heya nîba tu kesî bi wî awayî ne êşandiye.

119 - Wê demê bînin bîra xwe... Xwedê di roja piştawiyê de, ji Îsa kurê Meryemê re wê bibêje û jê bipirse: te ji xelkê

re gotiye, hon ji Xuda pê ve min û diya min jî, ji xwe re bikin xwedê?

Îsa wê bibêje, xudayê min, ê mezin tu f, tu bê hevber û hempa yî, ez evdê te me, ez çawan dikarim tiştekfî ne rast bêjim, ev ne la-yiq û şayesteyî min e, heke min wiha bigota, te ê bizaniya, dizî û aşikare; tiştên ko di dilê min de veqartî ne tu pê dizanî, lê ez tiştên ko tu li cem xwe vedîşerî nas na kin, tu veqartiyên her tiştî dizanî;

120 - Min ji wan re bitenê tiştên ko te ji min re emir kiriye gotiye, min ji xelkê re got ji xudayê min û xwe re ibadetê bikin û wextê ko ez di nav wan de bûm, min dîna xwe dida wan û min ne dihiştî ko ew tiştî ne bê rê bêjin; piştî ko te ez

mirandim û ez hilanfm, ba xwe; dibna xwe dida wan û tu her tiştî dibînî û dizanî.

121 - Heke tu wan bi ezabî diêşîni, ew evdên te ne, li gora daxwaza xwe bi wan dikî û eger di gunehên bawermendan diborî dîsa emrê te ye; yê xudanqdrê û fêris tu f.

122 - xuda dibêje, mirovên bawermend di roja piştawiyê de wê bibînin, dilpakîya wan çawan bikêrî wan bê, ji bona wan buhuştên tîr av û kanî hene û ew tê de her bîmfîn, xuda ji wan wê razî û dilxweş bibe û ew jî ji xudayê xwe wê razî û pê şikirdar bibin û bextiyariya mezintir ev e.


123 - Erd û ezman û her tiştên ko di wan de ne milkê xwedê ne, û ew bi her tiştî dizane.

## MIRÊKA CIHANÊ



**Qehwa Vexwarîneke Hêja ye**

Hemî xelkên Cihanê ji vexwarina qehwê hez dikin. Qehwa di welatên germ de çêdibe. Wêneya me xelkên Hindi-Çîniyê pêş me dike yê zehf qehwe dîçînin.



**Payetextê Çekoslovakayê Prag**

Payetextê Çekoslovakayê Prag şaristanekî mezin û spehî ye; di vî bajârî de 800.000 peya rûdinin. Rûniştîmanên erdê Çekoslovakayê 14 milyon in.

**Strana Kurdî:****HEFTSEDE**

- 2 -

Lê warê...

Erê sibeyê, li min tiştê zuwa.  
Heftsedê dotmama Genc Xellî  
Axa li jor tewla mala babê xwe  
ketiye;

Hespekî qutanêr deraniye.

Tengê wî gidandiyê,

Bi qev û rojê ajotiyê,

Li serê duriyanê sekiniye,

Piştî qefla başbazerganê rûniştîyê,  
Têto başbazerganekî misilmana.  
Heftsedê dibêjît: Başbazerganê  
misilmana:

Tu bi Xwedê û Mihemed pê-  
xemberana,

Te pismamê minê Genc Xellî  
Axa ne dîtiye li welatê Xeyran û

Xirban,  
Bajarê kola Mehmûdî li Tilsîn û

Milsîn welatekî xerîbî ye?

Başbazerganî dibêjît:

Erê, Heftsedê, pismamê te Genc

Xellî Axa emrê Xwedê kir;

Min vegerato bi vê destana.

Ez hatim çûnana.

Heftsedê dibêjît: Erê başbazerganê

misilmana,

Hêviya min ji Xwedê û pêxem-

berana e,

Hêj tu ne gihîştî mal, termê te

dayim ser piştê di van hespana.

Lê warê.....

Têto başbazerganekî filana.

Heftsedê dibêjît:

Tu bi Xwedê û İsa pêxemberana,

Te pismamê min Genc Xellî

Axa ne dîtiye bi welatê di xey-

ran û xirbana.

Li bajarê kola Mehmûdî, Tilsîn

û Milsîn, bajarêkî xerîbiyê?

Başbazerganê filana dibêjît:

«Pismamê te Genc Xellî Axa çi

nav û nîşan e?»

Heftsedê dibêjît:

Rojê ji mal derketî, suwarî hes-

pekî boz î bayaziye;

Simkotî, simkirî, difin zornayî

ye, stêra Mexribî rawesta ye,

Suwarê ciwanekî Manegî ye,

Manegî duxxigî ye.

Zînê zerê tewrizî ye,

Serkel û silahbend dirizî ye,

Cotekî danisqa piştê zîfî çikilandî

ye.

Ew bi xwe simbel sor î sosinî

ye,

Qelunbeskê osmanî ye,

Berdefka wî kehrebî ye,

Û xencerê wî salihbegî ye.

Çef û egalê wî Mendelî ye,

Kurk û ebaya wî besrawî ye,

Şalê wî kermanî ye,

Bi çekmeya sîftalî ye,

Bi tomamê rûmanî ye,

Hoçkêdê wî sê gazên gaza qey-

serî ye.

Piştî qûna Boz î beyaz î li erdê

dikişî ye.

Pêr kaxezekê ji dotmama xwe

hinartî bû:

«Par nefer bûm, û ev sala yûz-

başî me».

Başbazerganî filana dibêjît:

Erê Heftsedê,

Min Genc Xellî Axa, pismamê te

ne dîtiye bi vê çavana.

Ez nakim bikim çu bêbextî û çu

derewana.

Lêwarê.....

Têto başbazerganî cuhiyana.

Heftsedê dibêjît:

Erê, tu bi xwedê û Mûsa pêxem-

berana,

Te pismamê min ê Genc xellî

Axa ne dîtiye li welatê di xey-

ran û xirbana

Li bajarê kola Mehmûdî Tilsîn

û Milsîn, bajarêkî xerîbî ye?

Başbazerganî cuhiyana dibêjît:

Pismamê te Genc xellî Axa ne-

saxekî nesaxan e.

Ser milê di du Romfan e,

Bir û avête xestexane.

Lê warê... Lê warê....

Heftsedê rabû, çil keç j' bo xwe

kom kirin,

Hemî romanî xemilandin.

Û ew bi xwe kire diktorê Loq-

man.

Û qesta pismamê xwe kir

Deh nefer hinartin:

Bila hemî diktora derkevin,

Dê diktora Loqman têtin û Genc

xellî Axa sax bikin;

Hemî diktora derketin, û batî

diktorê Loqman,

Û nizanî çawa xwe bi Genc xe-

llî Axa bînit derê.

Dest avête strana:

Ava Firatê çemê bi kend û lend e.

Ezê hespê Genc xellî Axa bibim

ser solbenda;

Ezê guharê xwe bikim nala;

Û bazingê xwe hûr, hûr bikim û

bizmarê;

Ezê kezi xwe bikim tenga,

Û biskêd xwe bikim deshevsara.

Herçî gav pismamê min Genc

xellî Axa derkevit bi koçmal û

çadîrana

Û da xelk na bêjin:

«Eve suwara korê Heftsedê çî

bê kar û bar e.»

Lê warê....

Genc xellî Axa çavê xwe vekir,

Got: «Ev strana te ji kî rê girtî

ne?»

Diktorê Loqman dibêjît:

Ez çûme ser nesaxa ji nesaxa

ewê girtin.

Genc xellî Axa gote diktorî:

«Heker tu va strana bo min bêjî,

Her stranê hespekî didime te.»

Dest avête strana.

Gote: Ew çil keçê digel libasê

xwe bikin:

Oda başbazerganî oqakî çîn e.

Kelek û gemiyê di Hacî Bedran

Axa, têno dikişîne,

Dê hêlo pismamê Genc xellî Axa

destê xwe li gerdenê zer werîne-

Lê warê..

Heke çavê xwe vekir, û berê

xwe dayî ko dît dotmama xwe

Heftsedê,

di vê gavê de mir.

Lê warê....

Ji bajêrî salî ne çime bajarê

Misrî ye.

Ezê piştî pismamê xwe Genc

xellî Axa, ezê sing û berê xwe

bikim li bin axê qebrê ye...

Ne ma yê, ne ma yê, ne ma

yê.

Dê bila ez nemînim piştî pisma-

mê xwe Genc xellî Axa, li ser

dinyayê!

Lê warê...

Ji vê odê ne çime çu oda.

Memkê min na bîne befrekê li

zozana.

Û xwe kişî, İna li serbanê di

vanî oda.

Ezê desmalekê çîn kirim, bavêji-

me çavê xwe,

Û ezê xwe avêjime avê, bila

bikim bi rûh de.....

yê ko berhevkiriyê: Th. bôis

**Rojnameya Ahen Dinivîse**

Rojnameya Ahen, ya ko bi zimanê farisî li Teheranê derdikeve, qala pîrsa  
Kurdîstana İranê dike û dibêje: roj berî rojêkê Hikûmeta İranê, diwê mixtarîyeta  
kurdîstana İranê qebûl bike.

Miletê kurd ev çend sal in vî tiştî dixwaze; kurdên İranê dixwazin ko zimanê  
kurdî di Kurdîstana İranê de, bibe zimanê resmî, zimanê hikûmetî û mehkeman;  
hemî karker û mêmûrên axa Kurdîstana İranê jî kurdan bête bikartin û di hemî  
medresa û xwendegahan de zimanê kurdî bête xwendin û kurd karên welatê xwe  
bi destê xwe biyerînin. Rojnameya Ahen bi ser ve zêde dike û dinivîse: hikûmeta  
İranê diwê xwe bîlezîne û heqê kurdan bide; beriya ko îş yekcar xira bibe. Li go-  
ra telegrofên dawîn qîwetên kurdî yê kurdîstana İranê û lekên Mela Mistefa Pa-  
şa hatîne dora sine û kirmansahê; û kurdên van erdan bi şabûnî xwe gihandine  
wan. Ji aliyê din ev nûçeyên serfiraziya kurdan gihane kurdên lor û beziriyê û ev  
ji pê zehf şa bûne û arîkariya xebata azadî û istiqlala Kurdîstanê dîkin.

**Kovareke Nuh; Mad**

Di Teheranê de, Kovareke nû bi navê Mad dest bi derketinê kiriye. Ev kovar  
bi pîrsên kurdî yê zanîn û zanistî, yê çand û komelî, dîrok û çîrokiyê mijalî dibe.  
Gerîndegê wê Aka Azadpûr e. Niha di Teheranê de du kovarên kurdî yê farisî-  
ziman hene: Kûhistan û Mad. Ji van kovaran pê ve di kurdîstana İranê de zehf  
kovar û rojnameyên kurdî û kurdîziman derdikevin. Hêviya me ji Xwedê eve ko  
xebata brayên me kurdên İranê tevî yê Tirkîyê û Iraqê berxurdar be.

**Cigareyên Tamdar**

Cigareyên çetir û tamdar, yê  
Rejîya Libnan-û Sûriyeyê ne,  
Jokey-Klub, Yekemîn, Befra,  
Tatli-Sert, Vircinya, Oriyen, Zo-  
diyak; ev cigareyên he hemî, ji  
tiîneyê çetir û paktir tene çeki-  
rin. Piştî xwarinê cigareke baş,  
dilê cigarevxwaran vedike.

Gava dixwazin cigarekê ve-  
xwin, navên Jokey-Klub, Yekemîn-  
Birincî, Befra, Tatli-Sert,  
Vircinya, Oriyen, Zodiyaq bînin,  
bî ra xwe û yek ji wan paketan  
ji xwe re bibijêrin.

**ÇAPA KURDI**

Niha bi zimanê kurdî hevde kovar  
û rojname derdikevin. Ji van pê ve, li  
Bêrûtê, her pînzde roj carekê, bi zima-  
nê frensîzî rojnameyek derdikeve; navê-  
wê « Le jour Nouveau » ye; çar rûpelên  
di wê ên mezin hene. Ev rojname qala  
çand û nivîsar û siyaseta Kurdîstanê  
dike û doz û dehuwa miletê Kurd, lêze  
pêşgavên cihanê. Ev in navên kovar û  
rojnameyan û welatên ko lê de lêne çap  
kirin. Li Sovyetîstanê: Rîya Taze, Kov-  
ra Qeqasê.

Li İranê: Peyam; Nîştîman, Kûhistan,  
Zegros. Çiya, Tîrîske, Yekîtiya Têgûşîn  
Li Iraqê: Azadî, Jîyan, Gelawêj, Den-  
gi - Kîltîjî - Taze.  
Li Samê: Hawar, Ronahî.  
Li Bêrûtê: Sîr; Rojû Nû.

**PÊJINÊN DINYAYÊ****Ji Bergehên Ewistiryayê: Insbruk**

Xelkên Ewistiryayê jî bi zimanê elemanî xeber didin;  
lê ew ne mîna rûnîştîmanên germanîstanê serxwaz û leş-  
kerperest in. Di vî şerî de, der tenîsta elemana bûn; lê  
Hevalbendan ew ne şandine; berva jî bi dilekî rehimdar  
li wan nêrine, arîkariya wan kirine; û ew jî nû ve gihane  
azadî û serbestiyê û jî xwe re hikûmetek danîne

# LE JOUR NOUVEAU

Direction : Beyrouth Wakfs Tabet  
Place des Canous Tél. : 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE

Directeur-Propriétaire : EMIR Dr. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 25 P.L.S. - Abonnement :  
Liban-Syrie 25 L.L.S. Etranger 4 L. Stgs

## OBJECTIVE

Comme nos lecteurs ont pu le remarquer, en ce qui concerne la question kurde, nous nous sommes toujours efforcés d'exposer dans « Roja Nû » les faits dans leur stricte objectivité. Afin d'éclairer les esprits, nous avons publié documents et points de vue qui permettent de se faire une idée juste de la question. Notre but et notre désir ont toujours été de favoriser l'équilibre des pays du Moyen Orient en exhortant les uns et les autres à comprendre leur situation réciproque, à chercher les terrains d'entente plutôt que les points de friction, bref à être des facteurs de progrès et non point des causes de trouble.

Fidèles à notre programme, ce sont des extraits de la presse iranienne que nous soumettons aujourd'hui à nos lecteurs. Les quelques réflexions qui suivent n'ont d'autre but que de les mieux situer.

Nous savons qu'à Paris, en 1928, par l'intermédiaire de l'Ambassade de Perse, et en 1929, une délégation Kurde fit une démarche près du Gouvernement iranien. Il s'agissait d'assurer aux Kurdes d'Iran une certaine autonomie culturelle. On demandait l'enseignement de la langue kurde dans les écoles et la nomination de fonctionnaires kurdes dans les districts habités par les Kurdes, bref de donner aux Kurdes la possibilité d'évoluer et de renforcer ainsi l'Etat Iranien.

